
HAIKU



Berken Bereh / Istanbul

Haiku navê helbesteke japonan ê kin e ku ji sê ristan Go_ Shîchî_ Go (pênc_ heft_ pênc) û hefdeh kêteyan pêk tê. Helbesta japonî li ser vê helbestê ava bûye. Îro jî her sal li japonsya mehricana haikuyan tê lidarxiztin û helbestvanên haikuyan ên welatên din diçin vê mehiricane. Mîna figûrên çanda japonan ên mîna xwarina xav geisha, kimono, harakîrî, gulaşa somo, dêlindêzên, çayê, yakuza û hwd. haiku jî piştî ronesansa japona gellek deverên dinyayê belav bû û bi dilşadî hate pêşvazîkirin û bandoreke ecêb li ser helbestvan û helbesthezan kir. Îro ro

hema tu welatek nemaye ku helbestvanen wê ev cûre helbest neceribandine û ne- jivîsandine. Dîsa gellek haikuyên japonî hatine wergerandin li zimanên din.

Gerdûna haikuyan:

Ji ber ku Haiku helbesteke kin e mirov dibêje qey nivîsandina wan gellekî hêsane. Lê dema mirov xwe bera nav haiku û dinyaya wê de berdide mirov dibîne ku bi zimanêkes fêh û vegotîneke balkêş û bi sirûştê re lihevhatiye. Her du rîstên ewil ku kêlikek jîyanê bi çavdêriyeke asayî asayî vedibêje bi rîsta dawî ku mirov

şaşwaz dike diqede. Wekû ku di mentiqê de ji du tiştan tiştêkî bê derxistin. Nefesa ku di her du ristan de hatiye girtin bi sêyê bi yek derbê ji hundirê mirov derdikeve. Bi jî mirov rehet dibe. Di heman demê de dil-ferehiyekê dide mirov.

Ji alî teşeya xwe jî balkêşe Tenê hefdeh kîte zêde nebêje, kûr bifikire, dûr bifikire û baş bifikire û bibêje û hew. Mîna peyker-taşek zêdehiyên kevirî bavêje, heta te a peykerê herî xweşik û sade çêkir. Ev sînorkirin hev wisa hêzdariyekê jî dide mirovî. Helbestvanê Kaikuyan ji hezar çavnêriyên xwe ên kêlikê dineqîne û tenê sê ristan jê dinivîse. Bi vî awayî helbesteke fesîh û sade diafirîne.

Ev çar salin ku serê xwe li ser vê cûre helbestê diêşînim û dixwazim ruh û dinyaya wê binasim, lê ji ber ku ez bi japonî nizanim têkiliya min her tim bi zimanê dûwemîn çêdibe. Helbest wergerê orîjînalîteya Haikuyan xera kiriye. Ji ber wê jî ez nabêjim ku Haikuyên min bi qasî orîjînalên wan bi çêj û serkeftîne. Jixwe Haikuyên ku bi zimanên din jî hatineû tene nivîsandin jî hidikên wan di astaê japonîde ne. Sedemek vê jî ji cudahiya ziman tê lew re zimanê japonê japonî ne tewanbare. Tê kişandin û hema bêje her kiteyek wê bi tîpên dêngdêr diqede ji ber vê hindê li welatên din idestxizina kêşeya (pênc_ heftû_ pênc) zore. Lê dîsa jî her welatî helbestvan dev ji nivîsandina vê cûre helbestê berna-

din.

Piştî van agahdariyan dixwazim bibêjim ku wek helbestvanek kurd, min xwest haya helbesthezên kurd ji haikuyan çêbibe û çêj û tahma wan bi zimanê xwe bitamije. Hêvîdarim ev ezmuneya min bo geşedana haikuyên kurdyên hêjatir bibe pêngavek ber kêmasiyan ez xwe davêjim tor û bextê seydayên hikuyên japonî û li ber giyanê wan bejna xwe dictemînim...

Çend mînak ji haikuyên welatên din;

Ji nivro ta êvarê

Beethoven û sîsêrkên gelawêjê

..Çêj û tahma çayê a di devê min de

John A. Hall

Bareş

Milên te dipelîne û

Hişyar dike xewnên te

Dowd Edward Rebinson

Em li parkê rûniştine

Ez û belçim

Di lehiyê de diherikin

Peter Duppenhaler

Metro

Libek berfê dihele
Li ser milê zilamekî

Peter Duppenthaler

Karê şevê
Siya min jî vire
Li çaviyek sindoqa vekirîde.

Koojin sakamoto

Li kafeya giravê
Tenê miremirek ji hêwirzeyê
Tav hêdfika diçe ava

L.A. Davidson

Li ser nameyê
Şopa pisîkê
A ji colorado

Yasuko Yasui

Çaya bi çîr xweştire
Di bagerê de ji qehweyê
Germ dike hundirê mirov wek bizotekê

Yuan Hsiuny wu

Stêrk dixuricin
Û zarokek
Esmanî boyax dike bi çavên xwe

Smiljka Gagic

Sîsirkeke belekî mezin
Bi her giriyê xwe re
Rojê hinek din dikişîne ber bi xwe

Hanaki

Di piyana çayê de
Esmanekî virtîvala

Stephen Hobson

